hejmar 52 - Havîn 2013

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Kurmancî ya Mêrdînê

Civîna Kurmancî ya 52yan, rojên di navbera 22 – 29.06.2013an de, li Mêrdînê hat li dar xistin.

Mêrdîn, wek bajarekî pirrengîn û dîrokî, xemleke Kurdistanê ye. Bi dirêjahiya hemû dîroka xwe, ji bo gelek neteweyan mêvandarî kiriye û ew hewandine. Bajarvaniyeke helez, ku nîşana vê pêkvejiyanê ye, afirandiye û ew bi comerdî dewlemend kiriye. Ji bo pirrengî û pirdengiya binecihên xwe û parastina wan sîngê xwe ji êrişên dijminan re kiriye mertal.

Vî bajarî, di gel hinde dijwariyên qewimî, dest ji pirrengî û pirdengiya xwe bernedaye. Hertim di gel binecihên xwe, yên kurd, suryanî, keldanî, nastorî, asûrî, tat, mihelmî, ereb, çeçen, tirk, turkmen, êrmenî, domî û cihû, di ahengekê de jiyaye. Ji dîn û mezhebên hevre, yên wek misilmanî, xaçparêzî, cihûtî û êzîdîtiyê, xweşbînî, tolerans û bêhnfirehiyeke bêhed nîşan daye. Bi vî rengî nexşeyeke Kurdistanê ya piçûk, wek neqş û nimûşên xalîçeyeke bedew, li ser dilê xwe raxistiye da ku dinya alem dahatiya welatê me qenc bibîne.

Civîna Mêrdînê di atmosfereke weha de li dar ket û xebata xwe di hilm û gulma hewaya wê gulistana spehî û şahane de domand.

Di civînê de li ser van babetan hat kar kirin: ***Kuvark, folklora Sadiq Bahaeddîn Amêdî, termînolojîya pizîşkî, termînolojîya zimannasiyê, taybetmendiyên devoka Celaliyan, têlkarî, pezxwedîkirin, tiba Melayê Erwasî û heşare.***

Ev hevalên han beşdarî civînê bûn: Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Omîdê Mistefayê Celalî (Bazîd), Lezgînê Çalî (Barzan), Ehmedê Dirihî (Çewlik), Elîşêr (Wan), Xalidê Hekarî (Hekarî), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Eyûb Kiran (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Selam Nûman (Qamişlo), Têmûrê Xelîl (Rewan), Prof. Dr. Kadri Yildirim (Licê), Prof. Dr. Abdunnasir Yildiz (Ma'den), Reşo Zîlan (Agirî).

Em berhemên ji vê civînê li jêrê pêşkêş dikin.

Kuvarik

Amadekar: Prof. Dr. Abdunnasir YILDIZ

kurdî	latînî	tirkî	fransizî	îngilîzî
kuvarik, kuvark, kivarik, kifkarek, kakvîlk, karkulîlk,kumfeqîrk, karok, karî(k), kumik, qarçik, figeroşk, feqîrok, fitrik	*Fungos, agaricum*	mantar	champignon	mushroom
noka şivana	*Helianthemum salicifolium*	domalan otu	hélianthème à feuilles de saule	willow leaved rockrose
dobelan, domelan, dombelan, dolberan, kimê	*Terfezia boudieri*	yermantarı, domalan	truffe des sables, terfès	desert trufle
dobelana reş, kimeya reş	*Tuber melanosporum*	kara yermantarı	truffe noire	black truffle
goştberxik	*Morchella sp*	kuzu göbeği mantarı	morille	morel
fisgur, fisa gur, fisa kûçikan	*Lycoperdaceae*	kuzu mantarı,	vesse-de-loup	puffball
pîşo - 1	*Fomes fomentarius*	kav mantarı	amadouvier	(hoof) fungus
pîşo - 2	*Funalia trogii = Trametes trogii*	çürükçül mantar	tramète	trametes
kuvarika bîyan (bihan)	*Pleurotus ostreatus*	kayın mantarı, istiridye mantarı	pleurote en forme d'huitre	oyster mushroom,
kuvarika kinkor	*Pleurotus eryngii*	çaşır mantarı	pleurote du panicaut	king trumpet mushroom
sing	*Armillaria mellea*	bal mantarı,	armillaire de miel	honey fungus
kuvarikên kûçikan	*Coprinus atramentarius*	bir tür pösteki mantarı, mürekkep mantarı	caprin noir d'encre	inky cap
kuvarika keleman	*Amanita vaginata*	göbelek,	amanite vaginée	grisette
kuvarika sor	*Amanita muscaria*	gelin mantarı	amanite tue-mouche	fly agaric / fly amanita
kuvarika rastan/ kuvarika giya/ mêrga /guheran/ karîya merîya	*Agaricus campestris*	çayır mantarı	rosé des près	field mushroom
kuvarika daran/ darone	*Boletus edulis*	çörek mantarı	cèpe, bolet	penny bun / porcino / cep
kuvarika keran	*Coprinus comatus*	söbelen, pösteki mantarı	coprin chevelu	shaggy ink cap
kuvarika qewaxan	*Agrocybe aegerita*	kavak mantarı	pholiote du peuplier	poplar mushroom, velvet pioppino


Noka şivana
Helianthemum salicifolium


Dobelan, domelan, dombelan, dolberan, kimê
Terfezia boudieri


Dobelana reş, kimeya reş
Tuber melanosporum


Goştberxik
Morchella sp


Fisgur, fisa gur, fisa kûçikan
Lycoperdaceae


Pîşo - 1
Fomes fomentarius


Pîşo - 2
Funalia trogii = Trametes trogii


Kuvarika bîyan (bihan)
Pleurotus ostreatus


Kuvarika kinkor
Pleurotus eryngii



Sing
Armillaria mellea


Kuvarikên kûçikan
Coprinus atramentarius


Kuvarika keleman
Amanita vaginata


Kuvarika sor
Amanita muscaria


Kuvarika rastan/ kuvarika giya/ mêrga /guheran/ karîya merîya
Agaricus campestris


Kuvarika daran/darone
Boletus edulis


Kuvarika qewaxan
Agrocybe aegerita


Kuvarika keran
Coprinus comatus

Ferhenga pezxwedîkirinê
- II -

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
be'randin, barîn / barandin; mîha ku xwê dixwaze bi ser şivana de deng derdixe	tuz yemek isteyen koyunun çobana seslenmesi	bêler, gémissement des moutons pour réclamer du sel au berger	sheep's call for salt lick
berangirtin, berangirêdan	koç bağlama	saillie par un bélier (brebis)	being covered by a ram
beran kokel kirin	koçu tecrit etmek	isoler ou séparer le bélier du reste du troupeau	to isolate / separate rams from the rest of the flock
beran soring kirin	koçu boyamak	teindre les béliers	to paint rams
berdelav, serav	koyunları suya götürme	abreuvage du troupeau à un point d'eau	taking the flock to a water source
berdelav (serav) kirin	koyunları suya götürmek	conduire le troupeau le troupeau à l'abreuvoir	to take the flock to a water trough
berhemên şîr	süt ürünleri	produits laitiers	dairy products
şîrê zinc, şîrê ter	doğumdan sonra oluşan ilk sarımsı süt, ağız sütü	colostrum, premier lait	colustrum, first milk, "liquid gold", beestings
xulundor, xundor, xelindor	ilk sütten yapılan mayasız peynir	fromage fait du premier lait non fermenté	cheese made of colustrum
mastê kîsa, mastê parzûna	süzülmüş yoğurt	yaourt filtré, la crème de yaourt cueillie après filtration (sorte de crème fraiche)	strained or liquid yogurt (labneh)
rûnê nivîşk	tereyağı	beurre	butter
rûnê helandî	sade yağ	beurre fondu	clarified butter, melted butter
tomast	katık olarak kullanılmak üzere kışa saklanılan ve tabaka tabaka kaymak, yoğurt ve çökelekten oluşan ürün	fromage onctueux, fabriqué avec la crème épaisse (qeymax) du lait et du yaourt pour consommation d'hiver	cream cheese made from thick cream and yoghurt saved for consumption during winter
bermîz reşandin	koyunlarda semizlik belirtisi olan idrar izi	humeur sécrétée par une brebis en chaleur éclaboussement d'urine de brebis	secretions of an ewe on heat, urine stain of an ewe (sign of a well-fed sheep)
berxbirrîn	kuzu kırpma	tonte de l'agneau	lamb-shearing
berxê şemze	bir haftalık süt kuzusu	petit agneau, agneau d'une semaine, agneau de lait	baby lamb, a-week old lamb
berxê êmilk	ilkbaharda doğmuş kuzu	agneau né au printemps (né prématuré), agneau du printemps	spring lamb, lamb born prematurely in the spring
berxê çirîza	ekim – kasım aylarında doğmuş kuzu	agneau né après l'agnelage (en général en octobre ou novembre)	late lamb, lamb born after the lambing season (generally in october or november).
berxê mîjo	her koyuna koşup süt emen kuzu	agneau qui s'allaite de diverses brebis	mismothering lamb
berxê kêrê	kesimlik kuzu	agneau destiné à l'abattage	lamb due for slaughtering
buşkul, bişkul, pişkul	koyun, keçi dışkısı	crottin de mouton ou de chèvre	sheep or goat droppings
cunî bûn, silikîn	irkilip kaçmak	prendre la fuite	to be startled, bolting
caris (hustûr)	cazgır	agitateur, fauteurs de trouble	troublemaker, agitator
fêza pez	koyunların dinlenme yeri	aire de repos pour les moutons	open-air pen
berfêzik, palîn	sürünün dinlendirildiği tümseğin gölgelikli yeri	endroit ombragé d'une pente ou d'une colline où se repose le troupeau de moutons	the shadowy spot of the hillside where the sheep rest
gelpûzdayîn	koyunlarda çenealtı şişmesi	gonflement sous le menton des moutons	milk neck
di egalê de pez dotin	laktasyonun ilk döneminde bol sütlü hayvanların sağılması	traire des brebis pendant la première période de lactation	to milk dairy sheep during the first period of lactation
elba bêriyê	ağaçtan sağım bakracı	seau à lait en bois	milking wooden bucket
şîrar	süt tulumu	outre à lait	lambskin milk-container
lolibên (lewlebên) meşkê	tulumun ağaç tutaçları	manches en bois d'une outre à lait	wooden handles of the skin milk-container
hingil	1. tulumda ayak kısımlarının bağı; 2. mecaz olarak kadınların sarkık memesi	1. cordon du bas de l'outre à lait ; 2. argot : seins flasques et tombants	1. bind of the ends of the skin milk-container; 2. idiom: pendulous woman breast
guhandîr, girêş, lem	komple hayvan memesi	pis, mamelle	udder
giroşk	tulumlarda delikleri tıkamak için vurulan düğüm	nœud bouclant de l'outre	knot to plug the holes of the skin milk-container
berdelav kirin	koyunları öğleyin sulamaya götürmek	conduire les moutons à l'abreuvoir à midi	to water sheep noontide
binparzûn	ikinci süzmeden arta kalan yağ tortusu	résidu de beurre après le second filtrage	fat residue left after second filtering
berxa şemze	körpe kuzu, süt kuzusu	agnelle de lait	tender lamb
berxa çirîzê: berxa serkoz	güzün doğmuş kuzu	agnelle née en automne	autumn-born lamb
berxa mîjo: berxa mijo	önüne gelen her koyunu emen kuzu	agnelle qui tête toute brebis qui se présente	sucking lamb (lamb that suckles whatever sheep)
mijandin	emzirmek	allaiter	suckle, suck
îbşîng: êvşîng, hevşik	yavrusu ölmüş hayvan	bête dont le petit est mort	animal that lost its kid
çêleka kundokî	yıl oniki ay süt veren inek	vache qui donne du lait toute l'année	cow that lactates all times of the year
bodelav, sergelî	sulamada öncü koyun	mouton qui guide le troupeau vers la source d'eau	bellwether, the sheep leading the flock (to water)
daketin (ya heywanan)	hayvanların çiftleşmesi	accouplement (des animaux)	mating
ebaqut, ebakurt, kerik	kısa aba	manteau (aba) court	with short aba
ebadirêj	uzun aba	manteau (aba) long	with long aba
guhankirin, lemberdan	doğum belirtisi olarak memelerin süt tutması	avoir les mamelles pleines (annonçant une mise bas proche)	have full udders
guhşekal	kulakları uzun ve geniş hayvan	qui a des oreilles longues et larges en forme de godasse (mouton)	long-eared (sheep)
qilç	eğik kesim	biseau	bevelled
xwe lê helikandin, xwe lê heliqandin	sürtünmek	se frotter contre	to nuzzle, to nudge
hoz kirin	kuzuları emzirmeden sonra koyunlardan ayırmak	séparer les agneaux de leurs mères après l'allaitement	separate lamb from mother after breastfeeding
'ilor, bîhna hilatî	koç ve tekelerin koç katımı döneminde salgıladıkları koku	odeur secrétée par un bélier pour attirer la brebis	odour (secreted by a male sheep to attract the female)
kurmî, kirmî	kurtlanma	infecté de vers	infested
qalboq	asfinik, naftalin	naphtaline	naphthalene
lêvse	alt dudaktaki anatomik özürden ötürü otlayamayan koyun	mouton à lèvre inférieure infirme (qui ne peut pas brouter)	bulldog-jaw sheep
dêlse	uzun kuyruklu koyun türü	mouton à queue longue	long-tailed sheep
pezbirîn, pezqusandin	koyun kırkma	tonte de mouton	sheep shearing
berxbirîn	kuzu kırkma	tonte d'agneau	lamb shearing
pezbirr, qusês	koyun kırkan	tondeur de mouton	sheep clipper

berxbirr	kuzu kırkan	tondeur d'agneau	lamb clipper
pûk kirin	hayvanların kötü hava koşullarını önceden sezmesi	pressentir le mauvais temps (animaux)	to foretell bad weather (esp. animals)
stû bi gulik, qirgulî	boynunda bir çift püskülü olan	qui a des pampilles ou pendeloques (pour les chèvres)	with two dewlap (esp. goats)
qurde	dişleri dökülmüş koyun	mouton édenté	toothless sheep
sarbûna mîhan	seks arzusu düşmüş koyun	diminution de l'instinct sexuel chez les brebis	decrease of ewes' sexual desire
sewsî bûyîn	sersemleşmek	être étourdie	to be scatter-brained
şivanê ragirtî	ücretli çoban	berger salarié	hired shepherd
şoraqî kirin, têrso bûyîn	hayvanların tuz istemi	avoir besoin de sel, être en manque de sel (animaux)	to ask for salt (esp. animals)
teriqandin	hayvan parlatılması/ kaçıştırılması	faire se débander le troupeau	to cause to stampede
teriqîn	hayvan parlaması/ kaçışması	se débander	to stampede
pizan, pizdan, pizdank	plasenta	placenta	placenta

Sadiq Bahaeddîn Amêdî - II

"Folklorê Kurdî"

Amadekar: ELÎŞÊR

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
bêdilîya… nekirin	gönlünü kırmamak	ne pas contrarier qqn, faire plaisir à	to please
	çağrı	annonce	announcement
ji qûn ve man	kıçı üzerinde oturup kalmak	rester assis, ne pas bouger de sa place	to stay seated
ripijîn: repisîn	dolup taşmak	fourrer, emballer déborder	to cram, pack
zirî	zirh	armure, blindage	armour
şeq: tîk, çik	dik	érigé, tout droit, debout	erect, upright
kaluxk: qewlik	kılıf	étui	pouch, purse
cemînok: barebû	salma, yardım	contribution, cotisation	contribution
neqil	kez, defa, kere	fois	time
verestin: veresîn	1. çözülmek, sökülmek; 2. … den kurtulmak	1. se défaire, se détricoter ; 2. être livré de, être débarrassé	1. to unweave, dissolve; 2. to escape, drop, fall
taq	1. tabaka; 2. kör pencere; 3. zafer takı; 4. tonoz; 5. duvarın iç tarafı; 6. iç tavan	1. étage ; 2. fausse fenêtre ; 3. arc, arche ; 4. voûte en arc ; 5. face intérieure du mur ; 6. plafond	1. stair; 2. aperture; 3. arc; 4. arc, 5. inside aspect of walls; 6. ceiling
kefka şûr: destîyê şûr	kılıç kabzası	poignée de l'épée	grip of a sword
çingil: çeng	kol	bras	arm
beraqil	akla yatkın/uygun	raisonnable	reasonable
kelem	kazık	pieu, pal	stake, pale
salox	salık, haber	description, narration, information	description, report, narrative, inform
tepîn	yıkılmak	s'effondrer	to collapse
tepandin	yıkmak	démolir, détruire	to collapse, make something collapse
kumzirî	zırhlı miğfer	heaume blindé	armoured helmet
zêrevan	gözlemci	observateur, guetteur	observer
zêrevanî	gözlemcilik	guet, observation	observation
bîv; bûv	yer, zemin	terre, terrain	ground
sexer şikandin/sexer birin; dane şermê	utandırmak	faire honte, embarrasser	to embarrass
pirt; pirtik	küçük parça	petit morceau, éclat	flake, fleck
navdest	hizmetçi	servante	maid
çep li xwe dan; çiv li xwe dan	kıvırmak	esquiver, faire un détour	turn aside
çep; çiv, fetil, fitlane	dönüş	tour, détour	turn
nestêle	kıyılmaz, değerli, gözü pek	valeureux, intrépide	valuable, dignified, bold
nehişyar; nehiş, bêhiş	baygın	inconscient	unconscious
çardest	karga tulumba etme	porté sur au moins quatre mains	carryed on at list four hands
kelegirî	ağlamaklı olma	être au bord des larmes	to feel like crying
baxwê; baxo	köle sahipleri	maître d'esclaves	master of the slaves
gûrisas	cüruf	scorie	dross
pêdivî bûn	gerekmek, gerekli olmak	avoir besoin, être nécessaire	to need, to be necessary
pêdivî	gereksinim	besoin , nécessaire	need, necessity
xwe lêk dan	hazırlanmak	se préparer, s'apprêter	to prepare, to get ready
ripijîn: tijî bûn	dop dolu olmak	être rempli à bord	to be overfull
ripijî; tijî	dop dolu	plein à bord	overfull, crowded
verevîn	dağılmak	se disperser	to leave (for a crowd)
pêçolk; pêçek, qundax	kundak	lange	swaddle
jêhatin	1. olanak, imkan; 2. maharet, kabiliyet	1. aptitude, capacité ; 2. compétence	1. facility, ability, capability; 2. competence
rênc	eklem	joint, peinture	joint
rêncî bûn	subluksasyon	luxation	subluxation
zax	kuvvet	force	strength
li teqekê	molasız, ara vermeden	sans cesse, sans relâche	continuously, unceasingly
kefş li ber vekirin	zahir kılmak	révéler, rendre manifeste	to make able to reveal
kefş li ber vebûn	zahir olmak	se révéler, se manifester	to be able, to reveal
benîzava	içgüvey	homme qui vit dans la maison des parents de son épouse	man who lives with his wife´s parents
berpêk; saq	tozluk	guetres	gaiter
teqn	çamur	boue	mud
xişîn, xişyan	kaymak	glisser	to slide, crawl
kurav; herîya rohn	sulu çamur	gadoue	sludge
şor kirin: xwar kirin, daliqandin	sarkmak, eğmek	incliner, suspendre	to suspend, hang
şor bûn: xwar bûn, daliqîn	sarkılmak, eğilmek	s'incliner, pendouiller	to suspend, hang
çavê xwe dan tiştekî; çav lê bûn, lê miqate bûn	göz kulak olmak	veiller sur qqch., prendre soin de	to take care of

Têlkarî

Amadekar: Hemîd KILIÇASLAN
Birahîm CÎHAN (Hosteyê têlkarîyê)

Standarda zîvê ku ji bo xişir û xemlê dihê bi kar înan 925 eyar e. Lê belê zîvê ji bo têlkarîyê divê % 100 ji zîvê paqij be û eyara wî zîvî 1000 be.


Di demên berê de, helandin, tewandin û pankirina zîvî bi rê û rêbazên prîmîtîf bi cih dihatin. Lê di dema me de, êdî makîne peyda bûne ku vî karî bi hêsanî dikin. Makîneyên berê bi hêza destan dişixulîn, lê niha bi motor û elektrîkê kar dikin. Îroj hilberînên têlkarîyê, di kargehên mezin de bi rê û metodên nûjen û bi awayên pêşketîtir dihê kirin.

Ev kar di destpêkê de ji bo amadekirina xemil û xişirên serdest û dewlemendan û herweha ji bo alavên xwarin û nîşanên meziniyê peyda bûye. Lê bi dû re bazin, gerdenî, kember, xilxal (xirxal) û cûreyên xişiran yên ji bo jinan jî di nav berhemên têlkariyê de cih girtiye.

Di amadekirina berheman de, di destpêkê de skelet dihên çêkirin. Li gora pêdiviyê, materyalên pêwîst li ser skeletan dihên rast kirin û motîfên xwastî bi têlên zirav dihên xemilandin.

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
şalîmo	şaloma (şalümo), kuyumcu şaloması	chalumeau de soudure	torch set
çift	çift, kuyumcu çifti	brucelles, pincettes de joaillier	jewelers tweezers
çifta mezin	kaynak çifti	pinces de soudeur	weld tweezers
çifta piçûk	çalışma çifti, telkari çifti	pincettes	small tweezers
pense	pense	pinces	tongs, pliers
penseya devgirover	yuvarlak ağızlı pense	pinces à tête ronde	round nose pliers
penseya nîvgirover	yarım yuvarlak ağızlı pense	pinces à tête semi-courbée	half round nose pliers
penseya devpehn	yassı ağızlı pense	pinces à tête plate	flat nose pliers
penseya devdirêj	uzun ağızlı pense	pinces à tête allongée	long nose pliers
penseya guharan	küpe pensesi	pinces pour boucles d'oreilles	earring pliers
pergel	pergel	compas	pair of compasses
mengene	mengene	étau	vice
têlbir	antep makası, telkari makası	ciseaux à couper les fils d'argent ou d'or	a scissors for cuting silver or gold
bireka zirav	kıl testere	bocfil	fret-saw
xiştek û xifşek	heştek takımı	set de bouterolles	doming block
xiştek	heştek	bouterolle	doming block
melefe	malafa	baguier-mandrin	mandrel
melefeya xelekan	halka malafası	baguier-mandrin	ring mandrel
serikê êgir	şalimo başlığı	bouche de chalumeau	mouthpiece of torch set
meftûl: têla karî	meftul teli	fil à euroncer	bending wire
qalib	kalıp	moule, matrice	mould
helandin: dewibandin	eritmek	fondre	to smelt

hin motîfên têlkarîyê yên naskirî	**bazi motifler**	**quelques motifs**	**some motifs**
dilik	kalp	motif de cœur	heart, heart motif
roj	güneş	soleil, motif de soleil	sun, solar motif
binefş	menekşe	violette	violet, violet motif
berberoj	ayçiçeği	tournesol	sunflower, sunflower motif
beybûn	papatya	pâquerette, camomille	daisy, camomile, daisy motif
navnivîsk	isimlik	porte-nom	name plate
goşî	salkım	grappe	bunch, raceme motif
gul	gül	rose	ros, ros motif
pinpinîk	kelebek	papillon	butterfly, butterfly motif
çavdîk	horoz gözü	œil de coq	"cock eye", "cock-eyed"



Şalîmo


Çift



Pense



Penseya devgirover



Penseya nîvgirover


Penseya devpehn


Penseya guharan


Penseya guharan


Penseya devdirêj


Pergel


Mengene


Têlbir


Bireka zirav


Xiştek û xifşek


Melefe


Melefeya xelekan


Melefeya xelekan


Melefeya xelekan


Meftûl: têla karî


Q a l i b

Hin modêl û motîfên têlkarîyê yên naskirî - Bazı model ve motifler - Quelques modèles et motifs - Some models and motifs


Motîf:
Dilik


Motîf:
Roj, berbiroj, pinpinîk


Modêl:
Guhar û hingulîska biqaş


Modêl:
Bazin


Modêl:
Kember




Modêl:
Gerdank, guhar û bazin

Heşare - Haşare - Insecte - Insect

- II -

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

kurdî	***Latînî***	**tirkî**	**fransizî**	**îngîlizî**
sîsirk, çirçirk, circirk	*Cicada plebeja*	ağustos böceği	cigale	cicadas
gezgezk, colbir, cûbir	*Gryllotalpa gryllotalpa*	danaburnu	courtilière	mole cricket
kêç	*Pullex irritans*	insan piresi	puce	human flea
kêça çûkan (çûçik, çivîk)	*Ceratophyllus gallinae*	kuş piresi	puce aviaire	hen flea
kuliyê medreban	*Locusta migratoria*	madrap çekirgesi	criquet migrateur	migratory locust
kurmê hundurê sêvan	*Cydia pomonella*	elma içkurdu	ver de pomme	apple codling moth
kermêşa tayê	*Anopheles maculipennis*	sıtma sivrisineği	moustique anophèle	malaria-carrying mosquito, anopheles
kurmê hundurê behîvan	*Eurytoma amygdali*	badem içkurdu	ver d'amande	almond seed wasp
mêşgewr	*Bemisia tabaci*	tütün beyazsineği	mouche à tabac	silverleaf whitefly
maşotê nîsk û nokan	*Heliothis* armigera	yeşilkurt	heliothis	heliothis
mêşa malan, mêşik, mêşa reş	*Musca domestica*	karasinek	mouche	housefly
moza sergînan	*Mellinus arvensis*	tezek arıları	guêpe	field digger wasp
moza sor, mozezebeş	*Vespa orientalis*	kırmızı eşek arısı	frelon	oriental hornet
pîrikên sor	*Tetranychus spp.*	kırmızı örümcekler	acariens, mite	tetranychus
sinik, reqik, qimil	*Eurygaster integriceps*	süne	punaise des céréales	sunn pest, corn bug
spiyê kincan, spihê kincan	*Pediculus vestimenti*	elbise biti	pou	body louse
spîyê serî	*Pediculus capitis*	baş biti	pou de tête (homme)	head louse
şêz	*Hippobosca equina*	at sineği	hippobosque du cheval ou mouche-araignée	forest fly
gewgewe	*Hypoderma bovis*	nokra sineği, büvelek	mouche du varon	ox warble-fly
gêre, gêrik, mûrî, mîro, mêrû, mûristang	*Monomorium pharaonis*	firavun karıncaları	fourmi pharaon	pharaoh ant
kulî	*Orthoptera*	çekirge	sauterelle	grasshopper
pêşî, kermêş, kelmêş, vizik, mixik	*Culicidae*	sivrisinek	moustique	mosquito


Sîsirk, çirçirk, circirk
Cicada plebeja


Gezgezk, colbir, cûbir
Gryllotalpa gryllotalpa


Kêç
Pullex irritans


Kêça çûkan (çûçik, çivîk)
Ceratophyllus gallinae


Kuliyê medreban
Locusta migratoria


Kurmê hundurê sêvan
Cydia pomonella


Kermêşa tayê
Anopheles maculipennis


Kurmê hundurê behîvan
Eurytoma amygdali


Mêşgewr
Bemisia tabaci


Maşotê nîsk û nokan
Heliothis armigera



Mêşa malan, mêşik, mêşa reş
Musca domestica


Moza sergînan
Mellinus arvensis


Moza sor, mozezebeş
Vespa orientalis


Pîrikên sor
Tetranychus spp.


Sinik, reqik, qimil
Eurygaster integriceps


Spiyê kincan, spihê kincan
Pediculus vestimenti


Spîyê serî
Pediculus capitis


Şêz
Hippobosca equina


Gewgewe
Hypoderma bovis


Gêre, gêrik, mûrî, mîro, mêrû, mûristang
Monomorium pharaonis


Kulî
Orthoptera


Pêşî, kermêş, kelmêş, vizik, mixik
Culicidae

Termsaziya pizişkî bi kurdî

- II -

Amadekar: Lezgînê ÇALÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
arihan, arihîn, arîn, aryan	acı çekme, kıvranma, sızlamak	agonie, souffrance, peine intense	agony, intense pain, , tingle
arihandin, arandin	azdırmak, çok acı çekmek, kıvranmak	irriter, souffrir beaucoup, gémir	to irritate, to make suffer immensely, to exacerbate
avis	gebe, hamile, döllenmiş	enceinte	pregnant
avis kirin	gebe bırakmak, hamile bırakmak, döllemek	imprégner, engrosser	impregnate
avisî, avisbûn	gebelik, hamilelik, gebe olma	grossesse	pregnancy
avis bûn	gebe olmak, gebe kalmak	tomber enceinte	to become pregnant
azar	ızdırap, acı, ağrı	affliction, souffrance, douleur, clacquage	affliction, to afflict injury
azardan	ızdırap vermek, acı vermek	affliger, faire souffirir	to make suffer
azardîtin	ızdırap çekmek, görmek, acı çekmek	souffrir de blessures	to suffer injury or wounds
baguhkulî	hava basıncındaki değişikilerinin neden olduğu orta kulak iltihabı	otite barotraumatique	barotraumatic otitis
bakterîkuj	bakterileri öldürücü	bactéricide	bacteriocidal
bakterîsekinînk	bakteriyostatik, bakterisavar	bactériostatique	bacteriostatic
bakterîxwar	bakterileri yok eden küçücük cisimler	bactériophage	bacteriophage
bakterîyayî	bakteriyel	bactérien	bacterial
bakterînas	bakteriyolog	bactériologiste	bacteriologist
bakterînasî	bakteriyoloji	bactériologie	bacteriology
hewarêk	havayolu, hava bacası	voie respiratoire, voie aérienne	airway, breathing passages
ziwa bûn, ziwa kirin	kurutmak, suyunu çıkarmak, çekmek	déshydrater	dehydrate
ziwabûn, ziwakirin	kurutma, suyunu çıkarma	déshydratation	dehydration
ziwabûyî, ziwakirî	kurutulmuş, suyu çıkartılmış	déshydraté	dehydrated
bêîyon	iyonsuz, iyonsuzlaştırılmış	déionisé	deionized
nejehrdar	zehirli olmayan, toksik olmayan	**non toxique, non** venimeux	non-poisonous
bêjehrkiri	zehir etkisi gideririlmiş, zehirsizleştirilmiş	désintoxiqué	detoxified
bêjehrkirin	detoksifikasyon, zehirsizleştirme, zehrini alma	désintoxiquation	detoxify, detoxification
mejîrawestîyayî	beyni çıkartılmış	crise cérébelleuse	cerebelar crisis
mejî rawestîn, mejî rawestandin	beynini çıkartmak	décérébrer	to decerebrate
mejîrawestîn, mejîrawestandin	beynini çıkartma	décerébration	decerebration
bêparmayî, bêparhiştî	mahrum, yoksun	défavorisé, privé de	deprived
bêpar man, bêpar hiştin	yoksun bırakmak, mahrum bırakmak	défavoriser	to deprive
bêparman, bêparhiştin	yoksunluk, mahrumiyet, mahrumluk	privation	deprivation

Termên zimannasîyê

- II -

Amadekar: Mistefa AYDOGAN
Newzad HIRORÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
zimanê bingehîn	temel dil	langue de base	base/matrix language
zimanên tamergatîv	salt özegeçişli diller	langues à ergatif absolu, ergatif complet	ergative–absolutive languages
zimanên parçeergatîv	bölünmüş özegeçişli diller	langues à ergatif partiel	split-ergative languages
hişyarîya zimanî	dilsel bilinçlilik	conscience linguistique	language awareness
astenga zimanî	dil engeli	barrière de langue	language barrier
guherîna zimanî	dilde değişme	changement linguistique	language change
civata zimanî	dilsel topluluk	communauté linguistique	language community
pêwendîya zimanan	dillerarası etkileşim	contact linguistique	language contact
mirina zimanan	dil ölümü	disparition de langue	language death
biryardana zimanî	dil belirlemesi	détermination linguistique	language determination
pêşveçûna zimanan	dil gelişimi	développement linguistique	language development
serdestîya zimanî	dilsel baskınlık	domination linguistique	language dominance
windabûna zimanan	dil yitimi	perte de langue	language loss
bendîya zimanî	dilsel bağlılık	loyauté linguistique	language loyalty
sexbêrkirina zimanî	dil sürdürümü	entretien de langue	language maintenance
plankirina zimanî	dil düzenlemesi, dil planlaması	planification linguistique	language planning
cografyaya zimanî	dil coğrafyası	géographie linguistique	linguistic geography
şoreşa zimanî	dil devrimi	révolution linguistique	linguistic revolution
zimanê edebî	yazın dili	langue littéraire	literary language
zimanê zindî	yaşayan dil	langue vivante	living language
zimanê piranîyê	çoğunluk dili	langue majoritaire	majority language
zimanê hindikahîyê	azınlık dili	langue minoritaire	minority language
zimanên yekkîteyî	tekseslemli diller	langue monosyllabique	monosyllabic languages
zimanê neteweyî	ulusal dil	langue nationale	national language
zimanê makî	anadili	langue maternelle	native language
duzimanîya tebatî	edilgen ikidillilik	bilinguisme passif	passive bilingualism
zimanên polîsentetîk	çokbirleşimli diller	langues polysynthétiques	polysynthetic languages
duzimanîya serekî	birincil ikidillilik, doğal ikidillilik	bilinguisme primaire	primary bilingualism
zimanên bisînorkirî	sınırlı diller	langues restreintes	restricted languages
zimanê îşaretan	işaret dili	langue des signes	sign language
sosyolekt	küme dili, grup dili	sociolect	sociolect
zimanê çavkanîyê	kaynak dil	langage source	source language
zimanê axaftinê	sözlü dil, konuşma dili	langue parlée	spoken language
zimanê standard	ölçünlü dil, standart dil	langue normative, langue standardisée	standard language
zimanê wergerê	erek dil	langue cible	target language
zimanê bazirganîyê	ticaret dili	langue de commerce	trade language
zimanê binecîyan	yerli dil	vernaculaire	vernacular
zimanê pîşeyî	mesleki dil	langage professionnel	vocational language
zimanê cîhanî	dünya dili	langue mondiale	world language
zimanê nivîskî	yazı dili	langue écrite	written language

Taybetmendiyên Devoka Celaliyan

Amadekar: Omîdê Mistefayê CELALÎ

1. Pêşgotin
Amadekirina ferhengan, -ji bo têrûtijîkirina van ferhengan- berawirdkirina devokan û lêkolînên li ser devokên zaravayan gelekî girîng in. Heke gelek -bi çi awayî hebe- çanda xwe ya di nava peyvên zimanê xwe de veşartî neparastibe, piştgirî ji taybetmendiyên devokên xwe negirtibe, zaravayên xwe berawird nekiribin û naveroka zimanê xwe bi van zaravayan zengîn nekiribe, ew ê nikaribe li hemberî bişavtinê bertekeke xurt nîşan bide. Niha em vegerin mijara xwe ya sereke:

2. Cih û Warên Celaliyan
Piraniya eşîra celaliyan li çarmedora Çiyayê Agiriyê bi cih bûne; lê belê hinekên wan li gelek deverên kurdistanî yên din jî belav bûne. Bi rastî min lêkolîneke xurt li ser devoka hemû celaliyan nekiriye. Ez ê di vê gotarê de tenê celaliyên li dora Çiyayê Agiriyê binirxînim. Celaliyên ku îro di nava tixûbên Tirkiya, Îran, Rewan û Azerbaycanê de hatine dabeş kirin û li der û dora Çiyayê Agiriyê belav bûne xwediyên taybetmendiyeke zimanî ne. Devoka wan a kurmancî jî di nava devokên kurmancî yên Serhedê de xwediyê hinek taybetmendiyan e.

3. Taybetmendiyên Devoka Celaliyan
3. 1. Wekî hemû Kurdên serhedî, ji bilî çend awarteyan pêşdaçekan (beşa pêşîn a daçekan) bi lêv nakin. Paşdaçekên ″re″, ″ve″ û ″de″yê her tim wekî ″ra″, ″va″ û ″da″yê tên bi kar anîn. Wekî nimûne:

Ez malê me.	Ez li malê me.
Ez malê têm.	Ez ji malê têm.
Diya xi **ra** bêje.	Ji diya xwe re bibêje.
Gund **da** kesek nemaye.	Di gund de kesek nemaye.
Zar teze rê **va** diçe.	Zarok teze bi rê ve diçe.

Berî 20 - 25 salan daçekên ″li″ û ″ji″yê bi awayekî kurtkirî an jî qelibandî dihatine bi kar anîn; lê niha ev form hema hema nemaye. Wekî nimûne:

Ij ku têyî?	Ji ku têyî?
Il ku ma ev gede?	Li ku ma ev lawik?
Tu**′j** ku têyî?	Tu ji ku têyî?
Ev gede**′l** ku ma?	Ev lawik li ku ma?

3. 2. Gava daçek bi pronavên ″wî″ an jî ″wê″yê ve gihiştibin hev û pronaveke hevedûdanî pêk anîbin, wê hingê mînanî hemû devokên kurmanciyê tên bi lêv kirin. Wekî nimûne:

Jê ra bêje	Jê re bibêje.
Tê da tiştek tine.	Tê de tiştek nîn e.
Jê bipirse.	Jê bipirse.
Hespê bîne, **lê** siyar we.	Hespê bîne û lê siwar be.
Ev riyeka herî ye, **tê ra** neçe.	Ev riyeke biherî ye, tê re neçe.

3. 3. Gelek daçekên ku wekî pêşgiran tên ber peyvê di devokê de winda bûne. Her wiha di hinek peyvên bi daçekan pêkhatî de jî pêşdaçek winda bûne. Wekî nimûne:

Ev gede zehf aqil e.	Ev kurik pir **bi aqil e.**
Tu *dil* xeber nadî.	Tu **ji dil** naaxivî.
Piya nesekine!	**Li piyan** nesekine!
Keçika wan a *maldamayî* jî mêr kiriye.	Keça wan a **di malê de mayî** jî mêr kiriye.

3. 4. Gihaneka ″û″yê hema hema nayê bi kar anîn. Li şûna wê çareseriyeke din hatiye dîtin. Carinan jî gihaneka ″û″yê bi giştî tê avêtin û nayê bi kar anîn.
Wekî nimûne:

Elî bave xi va çûne ser îş.	Elî û bavê wî çûne ser kar.
Zozan Rewşenê va mektew xundine.	Zozan û Rewşenê dibistan xwendine.
Kartol pîvaza va bikşîne.	Kartol û pîvazan bikşîne.
Kur bave va li hev nakin.	Kur û bav li hev nakin.
Şêl çêkêt va tev utî ke.	Şal û çakêtî bi hev re utî bike.
Zar-zêç zozanê mane.	Zar û zêç li zozanê mane.

3. 5. Veqetandeka yekjimar a nêr û pirjimarî tenê bi ″e″yekê çareser bûne.
Wekî nimûne:

Bave mi (bave′m) îşev nehat malê. (yekjimarî)	Bavê min îşev nehat malê.
Kare me yî îro kuta bû. (yekjimarî)	Karê me yê îro qediya.
Qîze wî çar he ne/hew in. (pirjimarî - mê)	Keçên wî çar heb in.
Ka **peree** wî hene? (pirjimarî - nêr)	Ka pereyên wî hene?
Jine şeherî xureke xuş dipêjin. (pirjimarî - mê)	Jinên bajarî xwarinên xweş dipêjin.
Dirane wî kurmî bûne. (pirjimarî-nêr)	Diranên wî kurmî bûne.

3. 6. Berê ji bilî hin rewşên awarte tu carî pronava ″min″ê nedihate bi kar anîn, lê niha ev taybetî pir caran tê binpê kirin. Sedema vê yekê jî ihtimala şaşfêmkirina zayendî ye. Lewre Celalî bi eşîrên din tinazên xwe dikin û dibêjin:

Mesewa wan fire ye, **″mi″**yê ra dêjin ″min″	Mezheba wan fireh e, ji ″mi″yê re dibêjin "min".

Bikaranîna gelemperî wiha ye:

Eva kure **mi ye.**	Ev kurê min e.
Eva qîza **mi ye.**	Ev qîza min e.

Heke di ravekê de pronava ″min″ê bi kar bînin jî kirpandinê (stresê) didine ser ″e″ya dawiyê û pronavê gelekî bi lez dibêjin "eva kure **min <u>e</u>″** û nahêlin tîpa ″n″yê ya pronavê bişide yan jî dubare bibe**.**

Kure **mi yî** jêhatî, eferim te ra!	Kurê min ê jêhatî, eferim ji te ra.
Qîza **mi ya** belengaz caka nexaş e.	Keça min a belengaz cardin nexweş e.

Heçî ku qala mijarê li ser nifşa mê be, wê hingê pir bi baldarî xwe ji bikaranîna ″min″ê didin aliyekî ku kesê li hember tinazeyên xwe pê neke. Lê belê mirov dikare bibêje ku ev form hema hema êdî ji aliyê hinek gundiyan ve tê bi kar anîn û li bajêr têk çûye.

3. 7. Tewanga navdêrên nêr li gorî dengdêran bi ″î″yê ye. Wekî nimûne:

Ozmîn giha diçinî**.**	Osmên giha diçinî**.**
Nîn bide **şivîn**.	Nên/xwarinê bide şivên.
Xulîm pez av dida.	Xulêm pez av dida.

Lê belê di peyva ku dengdêrên ″a″ û ″e″yê dihewîne de her du dengdêr jî ditewin. Wekî nimûne:

dewar – dêwêr, gavan – gêvîn, kalan – kêlîn, beran – bêrîn, çakêt, çêkît ...

Dêwêr bajo, bira nekevin zeviya.	Dewêr biajo, bila nekevin zeviyan.
Çêkît xu neke, hewa germ e.	Çakêtî li xwe neke, hewa germ e.
Bêrîn bifiroşe.	Berên/beranî bifiroşe.

3. 8. Tu carî peyvên ″nayê″ ya ku erêniya wê ″tê″ ye û ″neyê″ya ku erêniya wê ″were″ ye nakeve ser zimanan. Bi heman sedema zayendî, li şûna wê peyva ″nê″yê tê bi kar anîn.

Derde van **nê** kişandinê.	Derdê van nayê kişandin.
Nê vê derê!	Neyê vê derê.
Derdekî isa bêderman e, **nê** gotinê.	Derdekî wisa bêderman e, nayê gotinê.

3. 9. Pronava ″min″ê di ravekê de wekî qertafekê tê bi kar anîn. Her wiha pronava vegerok a ″xwe″yê jî tenê wekî ″x″yekê tê diyarkirin. Wekî nimûne:

Male′m qurbana te we!	Malê min qurbana te be!
Deste′x kaş ke, bira nekeve ber dêrî.	Destê xwe kaş ke, bila nekeve ber dêriyî.

3. 10. ″bi″ya di lêkeran de û di gelek peyvan de tîpa ″b″yê diguhêzin li gorî deveran ″w″yê an jî ″v″yê.

Vî gedî **buwe** ser hekîmekî.	Vî gedeyî bibe ser hekîmekî.
Dîk **newe suwe (siwe) nawe**?	Dîk nebe sibe nabe?
Malê **vewijêre**!	Malê vebijêre (bide hev)!

Heban **(hewan),** tebat **(tewat),** xebat **(xewat),** şabaş **(şewaş),** teba **(tewa)**, sebeb **(sewew)**...

3. 11. Hinek caran tîpa ″d″yê vediguhêzin tîpa ″r″yê û tîpa ″l″yê jî bi ″r″yê bi lêv dikin. Wekî nimûne:
Pidû (pirî), bila (bira) ...
Li gundê Noreşînê yî Bazîdê çend mal hene ku gelek tîpên ″d″yê wekî ″r″yê bi lêv dikin; lê ev awarteyeke devokê ye û li cihekî din rast nehatimê. Wekî nimûne:

Xurê bera xi birê!	Xwedê belaya xwe bidê.

Bi awayekî gelemperî awayê fermanê yê lêkera ”dayîn”ê ”bire” ye.
Wekî nimûne:

Ja nanekî **bire** mi.	Îcar nanekî bide min.
Wî sozî **nere** her kesî!	Wî sozî nede her kesî!
Peree wî hene, lê **bire** te **nere** te nizanim.	Pereyên wî hene, bide te yan jî nede te nizanim.

3. 12. Bikaranîna dema niha ya domdar di devokê de heye ku min kêm caran ji devokên din bihîstiye. Wekî nimûne:

Nêr

Ez î nexaş im, ez e ça herim wir.	Ez niha (va ez) nexweş im, ez ê çawa herim wir.
Tu yî (nî) nexaş î, te e ça herî wir.	Tu niha (va tu) nexweş î, tu dê çawa herî wir.
Ew î gêj e, ye pîçiya xwe bibire.	Ew niha (va ew) gêj e, dê pêçiya xwe bibire.
Em î ne hazir in, kê dikare bira worê.	Em niha (va em) ne hazir in, kî dikare bila were.
Hûn î nikarin herin, îva ye berf dibare.	Hûn niha (va hûn) nikarin herin, va ye niha berf dibare.
Ewana yî (nî) hatin, îdî em dikarin herin.	Ew niha (va ew) hatin, êdî em dikarin herin.

Mê

Ez a birçî me, nikarim dêrmîn bixwim.	Ez niha (va ez) birçîme, nikarim dermên bixwim.
Tu ya (na) astiya yî, hinekî sere xi dayne.	Tu niha (va tu) westiyayî yî, hinekî serê xwe dayne.
Ew a ducanî ye, nehêle bira aciz newe.	Ew niha (va ew) ducanî ye, nehêle bila aciz nebe.
Em a pag in, jine xelqê ne isan in.	Em niha (va em) pak in, jinên xelqê ne wisan in.
Hûn a li ku ne, dere we çima girtî ye.	Hûn niha (va hûn) li ku ne, derê we çima girtî ye.
Ewana a (na) hatin, de sivrê raxin.	Ew niha (va ew) hatin, de sifreyê raxin.

3. 13. Daçeka ”bi”yê bi temamî veguheriye ”pê”yê. Wekî nimûne:

Pê kêvçî bixwe kurem!	Bi kêvçî bixwe kurê min!
Pê destex na, pê kêrê qut ke.	Ne bi destê xwe, bi kêrê qut bike.
Pê gulekê bihar nê.	Bi gulekê bihar nayê.

3. 14. Dema bê ne bi ”dê”yê, lê bi ”e” yan jî ”ye”yê tê çareser kirin. Wekî nimûne:

Ez **e** siwê herim Bayîzdê.	Ez ê sibê herim Bazîdê.
Tu **ye** kingî worî!	Tu dê kengê werî!
Mal **e** siwê bar kin!	Mal dê sibê bar bikin!

3. 15. Daçeka ”ji bo”yê tê fêm kirin; lê belê hertim daçeka ”sa” yan jî ”sewa”yê tê bi kar anîn. Wekî nimûne:

Sa çi nehatî dewatê?	Ji bo çi nehatiyî dawetê?
Koxekî **sa** tendûrê çêdikim.	Koxekî ji bo tendûrê çêdikim.
Sewa wî ferq nake.	Ji bo wî ferq nake.

3. 16. Veqetandeka nêr a yekjimar carinan bi ”î”yê tê gotin carinan jî bi ”e”yê. Her du bikaranîn jî hene; lê belê bikaranîna ”e”yê berbelavtir e. Wekî nimûne:

Mi bave'x (**bavî**'x) ra go.	Min ji bavê xwe re got.
Kure te (kurî te) kur we, pişta te nê erdê.	Kurê te kur be, pişta te nayê erdê.

4. Encam: Bikaranîna devokê

Min li jêrê hinek nifirên devoka Celaliyan dane hev. Sedema berhevkirina nifiran ew e ku di nava axêveran de hevpar in û lewma jî berhevkirina wan ji beşên zargotinê yên din hêsatir e. Wekî nimûne:

Avê biwînî nîn newînî, nîn biwînî lê avê newînî!	Avê bibînî nên nebînî, nên bibînî lê avê nebînî!
Bav l'pêşiya kur ketî!	Bav li pêşiya kur ketî!
Bela'x ber piye'x da biwînî!	Belaya xwe di ber piyên xwe de bibînî!
Bin erebekê kevî, goşte te **teka**[1] va bigire!	Bi bin erebeyekê kevî, goştê te bi tekeran ve bigire!
Birûsk te xe!	Birûsk li te bixe!
Çûyîna te hewe; lê hatina te tune we!	Çûyîna te hebe; lê hatina te tune be!
Emre te kurt we!	Emrê te kurt bibe!
Gewrêş[2] gewriya te keve!	Gewrîêş bi gewriya te bikeve!
Herî, l'mi nezivirî!	Herî û li min nezivirî!
Herî, qe venegerî!	Herî, qet venegerî!
Heta'k xuş wî **hemasa**[3] pale wî!	Heta ku xweş bî hertim pale bî!
Hête te bişkê!	Hêta te bişkê!
Ij/ji vir neçî dera han!	Ji vir neçî dera han!
J'îro dernekevî siwê!	Ji îro dernekevî sibehê!
Kêrane xaniye te bişkê!	Kêranê xaniyê te bişkê!
Kotan koka we rawe!	Kotan li koka we rabe!
Kul, jan, dev, diran, bigire pişik - parxan!	Kul, jan, dev, diran, bigire pişik û parxan!
Kulfete te l'te gurê har we!	Kulfetê te li te gurê har be!
Mala te berê bê keve!	Mala te bi berê bayî bikeve!
Mala te kerkene we!	Mala te kerkene bibe!
Nexweşiya te l'te heyşt **nowe**[4] we!	Nexweşiya te li te heşt nobe be!
Nikulreşê[5] kevî!	Bi nikulreşê bikevî!
Piye te ber piye te nekeve!	Piyê te bi ber piyê te nekeve!
Qir koka we keve!	Qir bi koka we bikeve!
Sewta te bibire!	Sewta te bibire!
Şetele[6] l'te keve!	Şetele li te bikeve!
Tu sere riya berate wî!	Tu li serê riyan berate bî!
Tu xuş wî, hale reş da wî!	Tu xweş bî, di halê reş de bî!
Tu xuş wî, hemasa nexaş wî!	Tu xweş bî, hemasa nexweş bî!
Wayle/wayla **xewtêş**ê[7] ketî/ketê!	Weylê/weyla bi xewtêşê ketî/ketê!
Xeneqûtk **xeneq**a[8] te keve!	Xeneqûtk li xeneqa te bikeve!
Xêrê j'emre'x newînî!	Xêrê ji emrê xwe nebînî!
Xêrê jê newînî!	Xêrê jê nebînî!
Xudê **atara**[9] te bibirîne!	Xwedê atara te bibirîne!
Xudê koka we biqelîne!	Xwedê koka we biqelîne!
Zimane te ber dirane te keve!	Zimanê te bi ber diranê te bikeve!

Di vê gotarê de heta ku ji destê min hat, min taybetmendiyên sereke yên devoka Celaliyan bi ser hev de anîn. Helbet ev taybetmendî tenê beşeke wê ne û divê xebatên kûrtir li ser van mijaran bêne kirin.

---

[1] **tek:** tekereka erebeyê
[2] **gewrêş:** cureyekî nexweşiya ku gewrî pê reş dibe
[3] **hemasa:** her wisa, hertim, bi berdewamî
[4] **nowe:** di nexweşiya tayê de her careke bilindbûna germiya bedenê
[5] **nikulreş:** cureyekî nexweşiya mirîşk û perindeyên din e ku dema bi vê nexweşiyê dikevin nikilê wan reş dibe
[6] **şetele: 1.** qeza û bela **2.** karesat **3.** *mec.* kesê ku belaya xwe dike stûyê xelqê
[7] **xewtêş:** cureyekî nexweşiya ku mirovî xewar dike û mirov nikare zû bi zû ji xewê rabe
[8] **xeneq:** di qirikê de cihê ku bi xitimîn an jî şidandina wê ruhber dixeniqin
[9] **atar:** bingeh, bineçe

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information

Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN,** *Réalisation :* **M. HASSAN**